

Nûçe û Calakî

Nûçe û Çalakî

Birûskek Pîrozbahiyê

Seyadayê Cegerxwîn dibêje: *Dermanê me ye xwendin û zanîn...*

Xortên xwendevan, tev bûn Cegerxwîn...

Her bijîn, bijîn xortên nûhatî...

Her bijî, bijî Kurdistan herdem...

Bi dilekî geş û şad me nûçeya serkeftina keça xwendekar a Kurd Canda Welîd Bînbaş bihîst. Canda Welîd Bînbaş hemû ezmûnên xwendegeha bilind (Bekelorya/Abitur) li Elmaniyayê bi qezencek mezin û bilind kuta kir û rêya çûyîna Zanîngehê ji xwe re vekir. Em bi navê hevalên şaxê navend û başûrê Elmaniyayê yê Partiya Yekîtiya Demokratîk a Kurd li Sûriyê - Yekîtiya Demokratîk a Kurd li Sûriyê - Ji dil pîrozpahiya wê dikin û serkeftinê bo wê û hemû xwendekarên Kurd ên li mişextgehê û yên li welêt dixwazin.

Şaxê navend û başûrê Elmaniyayê ya PYDKS – Yekîtiya Demokratîk a Kurd

Nama Zanîngeha Helebê

1 -Li 10-06-2009z, ji ber ku gelek xwendekarên kolîca toreyan a zanîngeha Helebê fitka terxandina salane bi xwe re nebiribûn ezmûnê, wê lomê rê nedan bêtirî 500 xwendekarî ku ezmûna xwe bikin. Ew bûyera kirêt bû sersedema xirecîrek mezin li zanîngehê. Hêjaye ku em bibêjin- wek ku xwendekar dibêjin- ku cara yekeme ev fitik dibe sersedema bidûrxistina xwendekaran ji ezmûnên wan.

2- Di encama sekna 12ê Avdarê de, encûmena serokatîya zanîngeha Helebê ev sê xortên jêrîn ji zanîngehê qewtandin: 1- Alan Huseynî 2- Kawa Dîko 3- Evdî Remî.

Herweha agahiyek tekoz giha me ku. 120 xwendekarên Kurd bi qewtandinê hatin

azardan di bin navnîşana ku ew bûne sersebeba peydakirina fewdalîzmê di zanîngehê de.

Du Şev Helbestî

Komîta çalakî û şevbihêrkan li bajarê Helebê du şev helbesta Kurdî girêdan. Mîvanên herdu şevan ev helbestvanên Kurd, Awzê Kalo, Sêwiyê welêt, Bahoz, Nehrî, û di gel giropek ji rewşenbîr û evîndarên ziman û helbesta Kurdî bûn. Herdu şev bi hin helbestên tijî hesten nazik ji bal wan helbestvanan ve hatin xemilandin. Herweha bi pirs û vepirsînên wan beşdarên hêja ew şev zengîn bûn.

Girtiyên Newrozê

Weke agahiyên li ba me kombûne xuya bû ku hejmara girtiyên Newrozê (20+21) li bajarê Heleb giha derdora 120 kesan ji wan girtiyên çendek Erebb, û 17 kes kêmtirî temenê zagonî bûn. Ên biçûk ji zîndanê hatin berdan û ji derve ve, ji aliyê dageha tewanbariya biçûkan ve tên dadgehkirin. Herweha li 20-05-2009 an jî 35 hatin berdan, û ta nuha dora 67 kesan hîn di zîndanê de ne, û tu serdan ji aliyê xwediyên wan ve ji wan re nebûne.

Komîta rêvebirîya Newrozê van ton biryarên kirêt ji aliyê encûmena serokatîya zanîngeha Helebê ve, di dermafê xwendekaran û bi taybetî yên Kurd de û herweha van girtnên bi awakî tewşankî û nemaftdar çêbûne û çêdibin şermazar dike, û doza vegera xwendekarên qewtandî û berdana girtiyên mayîn ji berprsiyarê deslata dewletê dike. Ji ber ku ev kiryarên weha nerindî, zikreştî û nakokiyê diçînin .